




Leş û Tendûristî



Hestî û Qerqode



Her wekî çewa stûn xîvetekê radigirin, wesa hestî jî leşê me radigirin. Qerqodê mirovekê pêgehîştî jî 206 hestiyên pêk dihê ku hemû bi pêk ve dinwîsiyayîne û avahiyekê bihêz û nerm pêk dihînin. Qerqode endamên leşî diparêzin wek mejî, dil, ceger û sîhan.

Berî jî dayikbûnê qerqodê mirovî kirikirike û paşî ew kirikirik req û hişik dibe û dibin hestî. Qerqodê zarokê jî 300 hestiyên pêk dihê ku hêdî, hêdî ew hestî xwe lêk didin û dema mezin dibe bi tenê 206 hestî jê dimînin. Anku hindêk jî wan hestiyên jî hev dîr xwe lêk didin û hestiyekî pêk dinin. Jî pişkên serekî yê qerqodê: Kîlox, garîtê piştê, rikeha sîngî, û hestiyên her du dest û pêyan.





Mezintirîn hestî jî, hestiyên her du ranane ku leşê me heldigirin dema em radiwestin yan bi rê ve diçin.

Hestî di req û sivikin, hestî jî maddeyekê gelek mukim pêk dihên û ava wan ya xiloleye.

Biçûktirîn hestî di leşê me de, sê hestî ne ku di guhê me dane û navên wan: Çekoç, sindan û rikêbe û em bi rêyeka wan di bihîsin. Biçûktirîn hestî jî ji wan rikêbe ku dirêjahiya wî bi tenê sê milimêtir in.



Aya hestî dişkên?

Belê hestî jî encamê ketin û diribên bihêz hindêk caran diderzin û hindêk caran jî dişkên û jî hev cuda dibin.



Çewa hestiyên şikestî çê dibine?

Serên şikestî yên hestî careka di xwe li hev didin lê jî du heta sê heyivan pêve diçin.

Aya hemû hestiyên leşê me dikarin bişkên?

Belê hemû hestiyên leşê me, dikarin bişkên lê behra pitir dest, til û piyên me jî encamê ketinê dişkên.

